



*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*



*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

## **Tîrêjên Çarşembê**

**Xelek - 56**

### **Gelo Pêximber Îbrahîm Hûrî bû?**

**(beşê dehem)**

#### **Dawerên Fîlologî (Zimanî)**

Evin li jêr hin dawerên fîlologî derbarê nasnameya hûrî ya pêximber *Îbrahîm*:

**Dawera yekem:** Navê (*Ûrî*) û navê (*Hûr*) di navê hin hozên (êlên) Benî Îsrâîl da hatiye: "Xweda bi Mûsa ra axivî û got: Min Besel'îl kurê Ûrî kurê Hûr ji hoza Yehûza bi navê wî vexwendiyê"<sup>1</sup>. Gelek diyare ku peywendiya van herdu navan bi peyva (*hûr* = *hûr* = *xûr* = *ûr*) ra heye. Divêt em bêjin ku peyva (*Îbran*) di bingehê da peyveka ken'anî ye. Bingeha peyvê (*Habiru*) ye, û ev nav li wan êlan hate kirin, yên ku ji erdnîgariya Hûriyan (herêma Cizîrê li rojavayê Kurdistanê) hatin, çemê Ferat derbaskirin û berê xwe dane başûrê Sûriyayê û welatê Ken'an<sup>2</sup>.

**Dawera duwem:** Di Qur'anê da hatiye ku navê bavê *Îbrahîm* (*Azer*) bûye {**Îbrahîm ji bavê xwe Azer ra got hûn pût û latan ji xwe ra dikin xweda, ez dibînim ku tu û gelê te, hûn li ser rêya çewtin**} {ضَلَّالٍ مُّبِينٍ} <sup>3</sup>. Lê bi me ra derbas bû ku navê bavê *Îbrahîm* di Tewrat û Telmûdê da (*Tareh*) تَارَح bûye. *El Beydawî* البَيْضَاوِي di şîrovekirina xwe da dibêje ku (*Tareh*) nave û (*Azer*) jî lexeme û ku ev peyv bi koka xwe peyveka biyanî (ne erebî) ye<sup>4</sup>.

Di vir da tiştê ji me ra girîng ewe ku peyva (*Azer*) peywendiya xwe bi navê xwedayê rojê (*A-ûsar* = *Asûr*) ra li ba Sûbarî û Hûriyan heye. *Dr. Ebdulhamid Zayed* dibêje: (**Azer**) bilêvkirina rast ya peyva (**Asûr**)-e, ya ku şewazek ji şewazên (**Aşûr, Aşûr, Atûr**)-e<sup>5</sup>. *El Tabarî* الطَّبْرِي jî gotiye ku (*Azer*) navê pûtekî bûye yê ku gelê *Îbrahîm* jêra nimêj dikir<sup>6</sup>. Ev agahdarî jî dawera ayînî ya peyva (*Azer*) piştrast dike. Bi me ra derbas bû ku baweriya rojeyî (şemsanî) di ramana ayînî da li ba Sûmerî, Sûbarî û Hûriyan serdar bû, û herwisa li ba seranserê gelên ariyanî jî.

**Dawera sêhem:** Dawereka din jî heye, ya ku hevgirêdana navê (*Azer*) bi kelepura Sûbarî û Hûrî ra piştrast dike, ew jî hatina kîta pêşîne di navê padîşahê Sûbarî (*Azaarahû*) da ye. Dema ku şaxekî ji Amûriyan welatê Sûbartû dagîr kir, navê xwedayê Sûbarî (*A - Awsar* = *Asûr*) wergirtin û tîpa "ş" di zimanê samî da kete cihê tîpa "s" û navê xweda bû (*Aşûr*). Navê vî xwedayî bi şewazê (*Asur* û *Aşûr*) di kîta pêşîn da ya navên hin padîşahên Aşûriyan da jî ma. Ji

wan (*Assurhadon* û *Aşûrbanipal*) û ev kît di navên îbrî da bi şêwazê (*Ezer*, *Uzîr*, *Azer*, *Aliazer*) (عَزْر، عَزْرِي وَعَزْرِي، أَلْيَعَزْر) xuya bû.

Ji hêla din va tiştê balkêş ewe ku (*Azer* = *Azer* = *Ater* = *Agir*) di kelepura Yezdanî da ji navên agirin û heya niha jî di navê (Azerbeycan) da maye. Li Azerbeycanê perestgeheka zerdeştî girîng bi navê (*Azerteşp*) hebû. Di vê perestgehê da çapek ji pirtûka pîroz (*Avesta*) hebû. Di çîroka *Mihracê* مِعْرَاج ya zerdeştî da (derketina Zerdeşt bo asîman) ferîştekek heye, navê wî (*Azer*)-e<sup>7</sup>. Ji lew ra gelek gengaz û mimkine ku navê bingehîn yê navê pêximber *Zerdeşt* (*Azerdest*) be; yanê (xwediyê destê pîroz). Dîsa gengaz û mimkine ku peyva (*Zerdeşt*) lexema pêximberêkî di kelepura Yezdanî da be. Min ji hin oldarên ayîna Êzîdî bihîstîye ku dibêjin pêximber Îbrahîm yek ji wan kesane yên ku lexema (*Zerdeşt*) hilgirtine.

**Dawera çarem:** Di lêkolîneka berê da, bi me ra derbas bû ku navê pêximber *Îbrahîm* bi îbrî (*Ab-ram*) bû, yanê bavê qedirbilind. Wisa tê xuyakirin ku ev navê îbranî ji aliyê bilêvkirinê va ji navê (*Bah-ram*) di kelepura ariyanî yezdanî da nêzîke. Bi taybetî jî heger me hesabê wê yekê kir ku tîpa "e" (di kurdî da ê) di pir navên ariyanî da ji bo girêdana rengdêr tê, bi maneya (ê, yê). (Nimûne: Bav-ê kal), bi maneya bavê qedirbilind. Gelek balkêşe jî ku Kurd di pir rewşan da navê (*Îbrahîm*) bi awayê (*Îbram*) dibêjin; bi awayekî surîştî vedigerin ser bilêvkirina hûrî ya kevin.

Divêt em bêjin ku (*Behram*) di Zerdeştîyê da ferîştê xawênî û bêgunehiyê ye. Agirê (*Behram*) agirê yekem bû û padîşahê agiran bû, ew di Ariyana da agirê herî payebilinde; ji wî agirî, agirê perestgehan di bajarên ariyanî gewre da hatiye wergirtin. Baweriya gelemper ew bû ku (*Agirê Behram*) ji mayîna birûskê ye, û ku ew di keftelefa dijî şerxwaziyê da hêz dide mirovan. Her wisa *Behram* di kelepura ariyanî da navê extera (Mars)-e jî. Helbete hevgirêdana navbera meha Azarê û şahiyên Newrozê bi vexistina agir jî nayê veşartin. Belkî jî peywendîya navê (*Azarê*) bi peyva (*Azer*) ra hebe. Di pirtûka (*Avesta*) da lawîjek heye bi sernivîsa (*Behrem Yaşt*). Ew sirûda padîşahê cengê û serkeftinê ye. Ji lew ra jî pênc padîşahên Sasaniyan navê (*Behram*) hilgirtine<sup>8</sup>.

**Dawera pêncem:** Bûyerên şoreşa pêximber *Îbrahîm* li dijî perestina gelê wî bi padîşah *Nemrûd* va hatine girêdan. Ev nav di hin jêderên îslamî da (*Numrûd*) hatiye gotin û di Telmûdê da bi şêwazê (*Nimrûd*) hatiye<sup>9</sup>. Me di jêderan da ti şîrove ji maneya (*Nemrûd*) ra nedît. Em dibînin ku ew ji şêwazê kurdî (ne-mir = ne-mird) nêzîke, yanê (ew kesê ku namire = zindî ye). Em dibînin ku ji şêwazê kurdî (nû-merd) va jî nêzîke, yanê (qehremanê nû). Wek tê zanîn, zarava û devokên kurdî yên niha encamên wan zimananin, yên ku pêşiyên wan yên Gûtî, Kaşşî, Hûrî, Mîdî û yên din pê diaxivîn.

**Dawera şeşem:** Di Tewratê da hatiye ku *Nemrûd* kurê *Kûşe* û di bûyerên jînenîgariya pêximber *Îbrahîm* da hatiye ku kesê pêşniyaz kiriye *Îbrahîm* bi agir bisohtûnin keskî Kurd bûye. Di gotûbêjeka din da hatiye ku ew kesê pend daye, bi mectenîqê *Îbrahîm* bavêjin nava agir Kurd bûye. Di gotûbêjeka sêhem da hatiye ku duristkarê mectenîqê ji bo vê kiryarê kesekî Kurd bûye. Di beşê dawerên erdnîgarî da bi me ra derbas bû ku ew herêma bajarê *Nemrûd* têda ye, erdnîgariya *Sûbartû* ye, ya ku paşê bi navê (*Aşûr*) hate naskirin. Ev hemû fakt nîşanên wê yekê ne ku *Nemrûd* û gelê wî û *Îbrahîm* jî ji wan bûye, ji pêşiyên gelê Kurd, ne di warê erdnîgarî da, ne di warê nijadî da û ne jî di warê zimanî da, ne biyanî bûne.

**Encama dawî:** Hêjayî gotinê ye, em bêjin ku heya niha şikeftek li bajarê *Ûrfaya Hûrî* (li bakurê Kurdistanê) heye. Li gor gotûbêja gelêrî, dayîka *Îbrahîm*, dema ew hên zarok bû, ji

tirsan, ku Nemrûd wî neikuje, ew di wê şikeftê da veşartiye, û tê gotin ku ava wê şikeftê pîroze û yê ku jê vexwe ji nexwaşiyên sax dibe.

Li Êrfayê goleka pîroz jî heye. Dîsa li gor gotûbêja gelêrî, ew agirê ku Îbrahîm avêtin nava wî, veguherî û bû av. Heya niha jî tikes masiyên wê golê nagire; bi baweriya ku ew di bingehê da darikên êzingan bûn ku wê hîngê hatin komkirin daku agir pêxînin û pê Îbrahîm bisohtînin.

Heger me ev gotûbêjên gelêrî dan ser dawerên erdnîgarî, dîrokî û filologî yên li jor derbasbûyî, hîngê gengaziya ku pêximber Îbrahîm Hûrî bûye gelek xurt dibe. Hate diyarkirin ku malbata wî goçî (Êra Hûrî = Êrfa) kiriye û ne (Êra Keldanan) ya sûmerî li başûrê Îraqê, û ew vegeyiriyaye warê xweyî bingehîn, bajarê Êaranê (Êeran) yê hûrî ku 44 km li başûr-rojhilatê Êrfayê dikeve.

Bi sedema ku pêximber Îbrahîm hûrî bûye, ev yek me digihîne encameka din; ew jî ewe ku hevbeşbûneka nijadî, erdnîgarî û çandî di navbera Kurdan û hin êlên Êbranî da heye (hên pêş ku ew ayîna Cihûtî di sed sala 12-an b. z. da wergirin). Ev mijar bixwe pir girînge û hewcedarî lêkolînên dîrokî û arkêologî (şopnasî) yên kûr û firehe.

*Bi vî awayî em gihîştin dawiya xelekên "Tîrêjên Çarşembê".*

Çarşemb, 20.04.2016

## Jêder

<sup>1</sup> Sifer Al Khuruj, eshah 31, ayet 2. Li Genot Wilhelm jî binêre, rûpel 19.

<sup>2</sup> A. W. F. Tumlî, Fîlosofên rojhilat, rûpel 101. Francis Davidson û hinên din, şîrovekirina pirtûka pîroz, rûpel 172.

<sup>3</sup> Sûreyê Al An'am, ayet 74.

<sup>4</sup> Al Baydawi, Şîroveya Al Baydawi, 2/169.

<sup>5</sup> Abdulhamid Zayed, rojhilata hemdem, rûpel 434.

<sup>6</sup> Al Tabari, şîroveya Al Tabari, 11/467.

<sup>7</sup> Abdella Al Abadani, dîroka ayîna Zerdeştî, rûpel 75, 99.

<sup>8</sup> A. S. Migolivski, Nehîniyên Xwedayan û ayînan, rûpel 77, 78. Firas Al Sewah, Berfirehiya dîroka ayînan, pirtûka pêncan, rûpel 13. Abdella Al Abadani, dîroka ayîna Zerdeştî, rûpel 27.

<sup>9</sup> Abo Al Sheikh Al Asbahani: Mezinahî, 5/1608. Ahmad Ibbesh, Al Telmud, 86.